

**Dumahîk : Daxuyana dawî ....**

mafên mirovan , têkoşîna li dij toximperestî û îşkencê dinirxand , nemaze başbûna rola gelek kitleyên perlomenter li gelek welatan , rêxistinên civaka sivîl , mafên mirovan , sazî û rêxistinên neteweyên yekbûyî .

**Li dawî** , weke çawa kongirê bi rawestina bihneke bêdengî bona bîranîna Şehîdan , dest bi kar û barê xwe kiribû , û silav ji hemî rêxistin , dost û hogirên partiyê re , li hundir û derve rêdikir , wehajî nûneran karê xwe bi helbijartina komîteyê serkirdayetiye bi dawî anîn , digel soz û peyman hemiyan , ku bi dilsozî , li gor siyaset û şana partiyê , tozika hundirî , dê xebatê di siha durîşmên kongir , evên he de bidomînin . Ji bo:

✓ **Nûjenkirina jiyana hundirî ya partiyê û xurtkirina cîgeha wê di nav gel de**

✓ **Lidarxistina kongirekî niştimanî kurd li Sûriyê .**

✓ **Lidarxistina kongirekî niştimanî Sûrî tevahî .**

✓ **Têkoşîn li beramber hemî şeweyên tepsandin û zordariya li dijî jinan .**

✓ **Parastina zimanê kurdî û berxwedan di ber de .**

✓ **Azadî ji girtiyên Danezana Şamê û hemî girtiyê siyasî û xwedî nêrîn .**

✓ **Sûriya welatê hemiyan e .**

5 Berçille 2008 an Werger ji zimanê erebî

**Komîta serkirdayeti ya Parta yekîti ya demokrat a kurd li Sûriyê**

**Dumahîk: Tewana Kuştinê...**

ew kuştî û belkî kuştar jî têkildarê wê partiyê ne. Û ji ber ku rastiya lêkolînên li derbarî wan tewanan ta niha nehatine diyarkirin , destlat jî wan diyar nake û wê wek tişteki nepend dibîne. Loma jî, welatî neçar dibin sê aliyan têxin nav kevanên gunehkariyê (sîxurên asayişên dewleta Sûryayê , Tirkiyê û PKK bi xwe jî), û wan hemiyan bi lihevixistin û nerawestkirina civaka Kurd gunehbar dikin.

Li roja îro -piranî -eger em nebêjin hemî bûyerên kuştina mirov li civaka me li ser çend bingeş û egerên serekîn radibin: Nezanî, Bêkarî û Xizanî. Ew rûdawa hovane li ser van hersê stûnên paşdemayîna radibin û di wê heyamê de geş dibin.

Lê dîsa û tevî her tiştî, hêvî ew e, ku destlat û dezgehên wê yên dadweriyê bi şeweyek îjdlî bi erkên xwe yên rast û dadmend rabin û her kuştarekî û her mijarekê bi riya zagonê bidin ber xwe.

Hêvî ew e jî, ku rojekê pêş de şeweyên kar û zagonên dewletê yên kevin û ne dadmend yên keneperest werin guhertin û li gor rewşên demê û pêşdeçûna şaristaniyê werin nûjen kikin.

Em di wê baweriyê de ne, ku eger gunehê mirovekî çî be, hîç çê nabe ku jiyana wî wilo bi hêsanî, xwînsarî û bê dadkirin were tunekirin. Û eger sedem û behane jî çî bin, dîsa hemî cureyên tunekirina jiyana mirov cihê rûşekirin û şermezariyê ye û gereke her kuştarek bighê ber dadgehek dadmend û sezaya xwe li gor kiriyara xwe ya qirêj bibîne